



Vaksîn jiyanan di parêze  
Vaccination saves lives



# Vaksîndana COVID-19

Rênma ji bu hemî jinên planê ji bu  
dûcanîyê (dûgiyanîyê) dikin, yan  
ewên bi dûcan yan şîr didin

Kanûna duwem 2022



GIG  
CYMRU  
NHS  
WALES

Kurdish (Kurmanji)

**Vaksîndana COVID-19 gelek ya giringe ji bu jinên bi dûcan û ewên bi şîr.**

**Hate dupatkirin ku ew vaksînên COVID-19 yên niha li berdest li Qraliyeta Yekbûyî (UK) di karîgerin û tomarkirineka baş ya ewlekariyê heye. Ya giringe ku jinên bi dûgiyan bi zûtirîn dem bi tevahî vaksînê bidanin da ku xwe û biçûkên xwe bi parêzin.**

## **Çi amojgarî derbareyi vaksînên COVID-19 hene di maweyê dûgiyaniyê de?**

Lîjneya hevbeş ji bo vaksîndan û bergrîkirinê (JCVI) , grûpekê zanayên serbîxo ragehand ku jinên bi dûgiyan zûrtir li jêr metirsiyê ne ji derencamên metirsîdar yên nexweşiya COVID-19. ya giringe ku jinên bi dûcan bi zûtirîn dem bi tevahî vaksînê bidanin. Nabît vaksîndanê paşbêxin heta ku piştî biçûk bûnê. Eve ji bo parastina wan û biçûkên wane.

Bi sedan hzar jinên bi dûcan li şanîşîna yekgrtî (UK) vaksîna fayzer yan modêrîn wergirtîne û çî arîşên saxlemiyê nehatîne diyarkirin. Vaksîndan gelek ya karîgere di bergrîkirina nexweşiya COVID-19 ya sext. ev vaksîne ji koronavayrosa zîndî pé û neşên nexweşiyê ji bo jina bi dûcan yan biçûkê di malbiçûkî de bi vegohézît.

Herkesê dest bi vaksîndanê kîrî û daxwaz jê hatîye kirin qurta dûyê werbigirît di maweyê dûcaniyê de pêdivîye qurta dûyê ji heman corê vaksînê werbigirît eger pîştî qurta êkê çî karîgeryên alî yên metirsîdar nebin.

# Metirsiyên nexweşiya COVID-19 di maweyê dûcaniyê da çne?

Eger tu tuşî nexweşiya COVID-19 bûy di dumahî qunañên dûcaniyê da, tu û biçûkê te ptir dşên tuşî nexweşiyên metirsîdar bibin û pêdivî bi çareserkirinê li nexweşxanê yan çavdêriya çirr bin. dataya şanşîna yekgrtî (UK) ew çende da diyarkirin ku bi nêzîkî her jineka bi dûcan tuşî nexweşiya COVID-19 bûy û pêdivî bi çareseryê li nexweşxanê yan çavdêriya çirr bûy, nehatîye vaksîndan.

Jinên bi dûcan ewên ev nexweşiyên binyatî yên pzişkî yên dhên heyin, pîtîr dşên toşî astengiyên nexweşiya COVID-19 yên metirsî bin.

- arîşên sîstemê bergriyê
- nexweşiya şekrê
- pestana bilind ya xwîne
- nexweşiya dîlî
- tengenefesîya dijwar

Yan eger to:

- kêş zêdebe
- li ser jiyê 35 saliyê de be
- di maweyê çarêka sêyê de bî ji dûcaniyê (piştî heftîya 28)
- ji ewan bî yên rabrdûyê nejadî yên reş pîst yan xelkê asiyyayê hey.
- nehatîye vaksîndan yan nîmçe vaksîndan

Metirsiya giştî ji nexweşiya COVID-19 ji bu te û biçûkê te ya kême belê zêdebû li demê pêla êkê ji COVID-19.



## Eve çî raman dide ji bu min?

Eger tu ya bi dûcan bî, bi zûtirîn dem vaksînê werbigire. te pêdivî bi dû qurtan heye, bi kêmî 8 Hefî di navbera wan da hebin. eger te bi tamamî dû qurtên destpêkî wergrtîbin, tu pêdivî bi qurteka çespênerî bi kêmî pşitî 3 heyivan ji qurta duwem.

Vaksînên di demê dûcaniyê da astên bilind yên bergriyê didete te li dijî nexweşiyên metirsîdar.

Em te handideyin ji bo xwandina zaniyariyên harîkar yên kulîja royal ya pzişkî biçûkbûn û nexweşiyên jinan li ser vî lînikî: [rcog.org.uk/covid-vaccine](https://www.rcog.org.uk/covid-vaccine). Ew zaniyariyên di vir de dşêt harîkarîya te bikit ji bu dana birriyareka jê age eger te hndek prsiyarên zêdetir hebin digel mamaniya xwe yan nujdarê giştî baxve.

## Ez dişêm vaksînê werbigirm eger ez bi şîr bim?

Mfayên şîrdana biçûkî di berçavin. Ragehandina zanayan ji JCVI û rêkxirawa saxlemiyê ya cîhanî (WHO) ewe ku ew jina bi şîr dişêt vaksînê werbigirît. Eger tu bi şîr bî, yan jî te plan danaye şîrî bidey, tu dişêy berdewam şîrî bidey piştî tu dihêye vaksîndan.



## Vaksîn û berdari

Piştî wergirtina vaksîna COVID-19, pêdivî nake xwe ji ducaniyê (dûgiyaniyê) dûrbêxî.

Çu belge nînin ku vaksînên COVID-19 kartêkirin hebe li ser berdari yan derfeta te ya ducanbûnê (dûgiyanbûnê).

## Erê vaksînê kartêkirinê alî hene?

Mîna hemû dermanan, vaksîn jî dibine egerên kartêkirinê alî. Eve jî çunikî vaksîn kardikene ser handana bersivekê di sîstemê we yê bergriyê da. Zûrbeya van di sivikin û bi tenê çend rujekên kêmdînin, û ne her kesekî digirn.

Hîvîye 'namîlkeya piştî vaksîna COVID-19 çi rûdide' li vir berdest bixwîne: [phw.nhs.wales/covid-vaccine-what-to-expect](https://phw.nhs.wales/covid-vaccine-what-to-expect)

## Pêdivîye ez çi bikem?

Dê ji we re hête gutin ka kengî û li kêve hûn dê vaksînê wergirin. Di roja diyarkrî da, cil û bergekê praktîkî li ber xwe bike da ku bi asanî bigehne serê milê we. Eger we tirs ji deriziyê hebe yan jî hest bi dilgraniyê dken, ew kesê vaksînê dide we agehdar biken. Ew di we bi gehn û pşitgîriya we bi ken.

**Giringe ku hemî qurtên vaksînê bihêne wergirtin, da ku hûn baştirîn parastina dîmdrêj werbigirin. Parastinê li ser karta xwe biken û tekeziyê li ser wergirtina qurça duwemîn û paşî ya bihêz kirinê biken.**

## Eger li ruja diyarkrî ez nexweş bibim ez çi bikem?

Heke hûn nexweş bin, baştîre hûn li bendê bînin heta ku baş bibin da ku vaksînê werbigirin, belê pêdivîye bi zûtirîn dem werbigirin.

Nabe hûn beşdarî wergirtina vaksînê bibin eger hûn dorgrtî bin yan jî li hîvîya têsta COVID-19 bî yan jî di maweyê çwar heftîyan ji hebûna têsta COVID-19 ya erênî.

# Erê ya pêdivîye ez rêberinameyê bi şopînim eger min vaksîn wergrtibît?

Çi vaksîn 100% di karîger nînin, evca divê hûn rêkarên neteweyî û nawçeyî bi şopînin û:

- li demê ku hûn dihêne rawêjkin maskî li ber xwe bikin
- bi hîşyarî û rêk û pêkî destên xwe bişon
- pencereyan vekin da ku hewayê hênik bihête jur
- li rêberinameya niha bi şopînin li ser [gov.wales/coronavirus](https://gov.wales/coronavirus).

## Bîranîn:

COVID-19 bi rêya dilopên ji poz yan devî derdîkevîn belavdbît, bi taybet li demê axftinê yan koxînê. Ev dşêt bi rêya destkirina çavî, pozê û devî bihête helgirtin pşitî destkirina tîştekî yan rûyê tşitekî yê gemarkrî.

Ji bu her prsiyarek yan ptir zaniyariyan, to dîşeyî seredana [111.wales.nhs.uk](https://111.wales.nhs.uk) bikin, digel nojdarê xwe yan mamani baxve yan jî peywendiyê bi NHS 111 Wales bike.

Eger 111 li devera we nebe, hîvîye peywendiyê bi 0845 46 47 bikin. Peywendîkirin ji hêlên bejahî û mobaylan her xolekê bi behayê 2p (jbilî lêçuna asayî ya telefonê).

# Zaniyariyên zêdetir

Hûn dşên ptir zaniyarîyan derbareyi vaksînên COVID-19 bstînin, ku pêkhatîye ji hemû naverok û kartêkirinên alî yên dbît ruwîbiden li ser: **[coronavirus-yellowcard.mhra.gov.uk/productinformation](https://coronavirus-yellowcard.mhra.gov.uk/productinformation)**

Hûn dşên zaniyariyên zêdetir û namîlkeyên nexweşan bibînin li ser: **[phw.nhs.wales/covid-19-vaccination](https://phw.nhs.wales/covid-19-vaccination)**

Hûn dşên kartêkirinên alî yên gumanikrî bi serhêll ragehîni li ser: **[coronavirus-yellowcard.mhra.gov.uk](https://coronavirus-yellowcard.mhra.gov.uk)** yan jî bi dakêşana Yellow Card app.

Da ku bzanin NHS çawan zaniyariyên we bikartîne, serdan bikin: **[111.wales.nhs.uk/AboutUs/Yourinformation](https://111.wales.nhs.uk/AboutUs/Yourinformation)**

ji bu furmên dî yên vê namîlkeyê, serdan bikin: **[publichealthwales.org/HealthInformationResources](https://publichealthwales.org/HealthInformationResources)**



© Tendrustiya giştî ya Wales NHS Trust, kanûna duwem 2022 (b agehîkirina ajansa saxlemî û ewlekariya şanşîna êkgrtî (UK))

Vegêran 3  
ISBN 978-1-78986-154-672

